

Rapora Me Ya Navenda Şêwr û Piştgiriye

Tebax 2021
Çile 2022



Kadın Zamani Derneği
Komeleya Dema Jinan
Women's Time Association

Destpêk

Ev rapor ji hêla ekîba me ya weqayan bi awayekî kolektif hatiye amadekirin. Di têkoşîna jinan de bi baweriya girîngiya ragihandina tecûbeyan, me xwest ku em rapora xwe ya yekemîn ya şeş mehane pêkhatayên Kyê di serî de bi hemû saziyên jinan re parve bikin.

Bi hêvî û piştgiriya cîhaneke wekhev û bêstargeh



Naverok

- . Pêşgotina Me
- . Statîstîkên Me
- . Xebatên Me Yên Qadê
- . Xebatên Me Yên Dîjîtal
- . Perwerdehî û Kargeh
- . Encam



Pêşgotina Me


Komeleya Dema Jinan bi armanca ji holê rakirina her cure cihêkariyên li hember jinan û tevkariya bihêzkirina jinan di 21ê Tîrmeha 2020an de li Stenbolê vebûye.

Girîngiya navendên şêwr û piştgiriyan ev e ku; jinek ji ber tundiya ku jiyaye serî lê dide û di pêvajoya têkoşînê de roleke aktif dilîze. Navenda şêwr û piştgiriye derdoreke ku jin xwe bi awayekî herî baş ragihînin û vebêjin ava dike. Ji ber zêdebûna weqayên tundiye sazî ji daxwazên piştgiriye re bi têra xwe nikarin bibin bersiv. Ji ber vê yekê saziyên nû yên xwedî şêwr û piştgirî dê piştgiriye bihêztir bike. Piştgiriye ku jin ji van saziyan digirin, di pêvajoya têkoşîna tundiye de ciheke girîng digire. Me jî tevî ku em hevgireke Navenda Şêwr û Piştgiriye û Stargehan in, piştî qedandina xebatên xwe yên hundirîn piştî tebaxa 2021an me vekirina navenda xwe ya şêwr û piştgiriye ragihand.




Statîstîkên Serîlêdanê

Di serîlêdanan de cureyên
piştgiriyan ku tên daxwazkirin




Statîstîkên Serîlêdanê

Çawa gihaşt me




Statîstîkên Serîlêdanê

Navenda me ya şêwr û
piştgiriye ji ku bihîst




Statîstîkên Serîlêdanê

Piştgiriya rasterast û beralîkirin




Statîstîkên Serîlêdanê

Rewşa aborî ya serîlêderan



Statîstîkên Serîlêdanê

Saziyên ku serîlêdan hatine kirin



Xebatên Me Yên Dîjîtal û Qadê

- Hesabên me yên torên medyaya civakî, malpera me û çavkaniyên ku navenda me ya şêwr û piştgiriye dide nasîn hat amadekirin.

-Broşûrên ku navenda me ya şêwr û piştgiriye dide nasîn hat çapkirin û li taxan hat belavkirin

-Vîdeoyên di derheqê nasîna navendê
hat amadekirin

- Podcasta ku me cureyên tundiyê
pênase kiriye hat amadekirin.

- Bi hevdîtinên jinan ên li sê
navçeyên cuda panel hat sazkirin.
Xebatên me yê navenda şêwr û
piştgiriya hat ragihandin.



Perwerdehî û Kargeh

-Bi Derûnnas Şînda Bariş Re Tundiya Arasteyî
Jinan û Mudaxaleya Derûn-civakî

KADAV

Statûyên hiqûqî yên koçberan, maf û
berpirsiyariyên wan

Di pêvajoya weqayan de xebata ekîban,
teknîkên hevdîtinê û travmaya neyekser



Perwerdehî û Kargeh

-TÎHV

Trawmaya duyem

-TÎHV

Perwerdehiya Sûpervizyoniyê



Encam

Ev rêya ku em ji bo bi armanca ji holê rakirina her cure cihêkariyên li hember jinan û tevkariya bihêzkirina jinan derketine dijwar e lêbelê ji ber bihêzkirin û mezinkirina têkoşîna me ya jinan girîng e. Weke Dema Jinan xaleke din ya girîng dema stendina serîlêdanan ji serîlêderan re ragihandina wekeheviya zayenda civakî û li hember tundiyê berxwedêrî ye.

Tevî ekîba me ya weqayê di serîlêdanên tundiyê de xala krîtîk ya ku em girîng dibînin; hissiyata azadî û ewlehiya serîlêderan e. Ev xal di perwerdehiyên ku em dikin jî mijareke bingeîn e.

Ji meha tebaxê ve heta niha ku me vekirina navenda xwe ya şêwr û piştgiriya ragihand, çavderiyên xwe yê serîlêdanan û pêdiviyên xwe yê ku em weke kêmasî dibînin bi we re jî parve dikin.



-Di tekoşîna tundiya arasteyî jinan gelek sazî, di qadên cuda de pênaseya tundiye û di mijara têkoşîna li hember tundiye xebat kirine û dikin. Di hevdîtinên me yê bi hin serîlêderan û di çavdêriyên xebatên qadê de me ferq kir ku mixabin di hin rewşan de em hê jî tundiye baş pênase nakin û ji ber vê yeke jî em nikarin bigihêjin rêbazên têkoşîna li dij tundiye. Me dîsa dît ku berdewamiya hişyarkirin û xebatên qadê gelek girîng e.

-Fikra "gelo em bi beralîkirinan dikarin piştgirî bidin jinan"? ji roja ewil ve pirseke meraqê bû. Ji roja ku me serîlêdanan stendiye bi bergeheka jinê bi rê û rêbazên femîst guhdarkirin, ragihandin û bi pênaseyên rast beralîkirina saziyên rast, me dît ku hem moral û hêz dide me hem jî dide serîlêderan.



-Fesihkirina Peymana Stenbolê, Ji alî bazbend û hin saziyên fermî de weke tuneye hatiye bikaranîn. Ev yek li ser serîlêderan jî bêewlebûn û diltirsiyekê ava kiriye. Ji serîlêderên ku di rewşa tundiyê de çûyîna li gel bazbendan red dikin, dema ku serîlêdanê dikin bêbersiviyê hîs dikin, em mafên wan jî nû ve radigihînin û em lê hay bûn ku bertekên erênî jî distînin. Li hember polîtîkaya jê vegerandinê li bazbendan rûbirû dibînin, piştgiriya li navenda me ya şêwr û piştgiriya anî bîra serîlêderan ku ew taybet in û divê ji bo jiyana xwe têbikoşin

-Em di serdemeke wisa de ne ku bi mîlyonan jinên kurd ji ber fikara xwe baş ranegihandinê, ji vegotin û têkoşîna tundiyê dûr disekine. Em weke Komeleya Dema jinan ji roja me ragihandiye ku em serîlêdanên bi kurdî distînin me dît ku tevî jinên ji saziyên cuda tîn beralîkirin û ji bo gihaştina agahiyên rast serîlêdanên li navenda me zêde bû.



-Piştî ku 5 mehê xwe qedand yek ji wan pêdîviyên sazûmanî ku me diyar kiribû jî tunebûna komisyoneke derûnnasiyê bû. Ji niha û pê ve di saziya me de ji alî derûnnasên me yê dildar ve komîsyonek hate avakirin û sêrîlêdan hatine stendin.





Kadın Zamani Derneđi
Komeleya Dema Jinan
Women's Time Association

Hüseyinađa Mah. Meşrutiyet Cd.
Aslıhan No:10
Beyođlu/İstanbul

info@kadinzamani.org

0542 602 69 62